

## Di roja cîhanî ya mafên zarokan de. rewsa zarokên Kurd li Sûrivê

Lava Derwêş

### *Hemû mafên peymanê ji hemû zarokan re (bend 2 peymanê mafê zarokan)*

Zarok li Sûriye nakevin ber vê peymanê de, tevî ko Sûriye ew pêbawerdan daye û di zagona xwe ya neteweyî de bi cih kiriye. Ew jî weke gelek peymanên dî yên mirovan li welatên tirs û qedexekirinan, deqek li ser kaxezê ye.

Mijara binpêkirin û paşguhkirina desthelatê ji mafê zarokan re gerekî lêkolînên berfireh e, di vê nivîsa xwe de dixwazim bi taybet behsa mafê zarokên Kurd bikim û bêparkirina wan ji biçûktirîn û giringtirîn maf .

Mafê jiyânê, nav, nasname, azadiya derbirînê, xwendin, perwerde, parastina ji îşkencê, ji tund û tûjiyê....

Ev hêmanên avakirina mirovekî saxlem in ku karibe di paşerojê civakeke dadmend û azad ava bike yan hevparê avakirina wê be.

Zarokên Kurd ji dema jidayik dibin ji van mafan bêpar in. Bar û êşên ji xwe mezintir hildigirin.

Bê nav in, bê nasname ne, tên girtin ji ber ew Kurd in. Ji hêla dezgehên dewletê, yên ku erkê wa ye wan biparêze, şeweyê hovane yê îşkencê li wan dikin. Dezgehên perwedeya yekalî, cudahiyê dixin nav wan de, herwha ji dev dibistanan berdidin an têne avêtin.

***Her zarokek ji mafê wê/wî ye, yekser piştî jidayikbûnê were qeydkirin, navlêkirin hemwelatîyê bistîne ( benda 7)*** Di çarçewa siyaseteke şofînîst de li Sûriye ku dijî Kurdan e, di 5/10/1962 de li herêma Kurdan, li Cezîrê, serjimara awarte hate pêkanîn. Di encamê de nêzikî 150.000 Kurd nasnameyên Sûrî ji wan hatin standin û ji mafê hemwelatîyê bêpar man. Heta roja îro bi berdewamî ev encam xwe dubare dike. Lewre bēnasnameya Kurdan ji dê û bav yekser dighe zarokan.

Gelek astengî di qeydkirina zarokê de derdikevin. Ev astengî bi xwestina erêniya

ewlekariyê dest pê dike heta ber dergehê dadgehê. Gava dê hemwelatî be û bav "biyanî be ango bê nasname be, zarokên wan) (mektûm in û nayên qeydkirin.

Ji hêla nav ve, ne ji mafê zaroka ye ko navekî Kurdî hilgire yan pê were qeydkirin.

***Li welatên kêmteweyên etnîk lê hebin, divê zaroka ne ji neteweya yekem be, bêpar nemîne ji perwedeya kultura xwe û zimanê dayikê. (Benda 30)***

Kurd di Sûriyê de neteweya duyem e. Rajeya hejmara Kurdan li Sûrî nêzîka 13-15 % e ji hejmara nişteciyan û ew li ser xaka xwe ya dîrokî ne. Lê nikarin bi zimanê xwe biaxivin û perwerde bibin .

Bi sala ye ku ramyariya erebkirina herêmên Kurdî berdewam e. Di systema perwerdekirin û dibistanan de nabe zarok ji bilî zimanê erebî bipeyivîn.

Benda 37an ji peymanê îşkence û girtina bi zorê yan ne ser bingeheke zagonî qedexe dike.

Li gor raportên dezgeha lêborînê ya navnetewî Sûriye ti rêzê li vê bendê nagire. Hemû şeweyên îşkencê li zarokên Kurd yên di zindanan de dibin.

Hêjayî gotinê ye ku di sala 2005an de, di roja zarokan ya cîhanî de, hêzên ewlekariyê êrişî zarokên Kurd kirin. Ew zarokên ko bi gurzên gulan û gazinên xwe ji ne pêkanîna bendên peymanê mafên zarokan, li ber navenda neteweyên yekbûyî xwepêşandanek lidar xistin.

Ji aliyekî dî ve zarokên karker yên li kolanan û bin mercên zor de kar dikin li Sûriyê bi giştî hene, lê ji ber rewşa awarte ya li ser Kurdan, hejmara zarokên karker yên Kurd bi gelekî bihtir e. Ew di karên ne yaseyî û yên metirsîyê de dixebitin û li kolanan dijîn. Bi gotinekê, zaroktî li welatê qedexekirinan qedexe ye. Û bi destnîşandineke taybet li Sûriyê tu rêz ji mafê zarokên Kurd re nayê girtin. **Ji malpera Avesta**

